Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :957 17 -Nîsan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

## Serpêhatiyeke her zarokê heye

**Li Rojava, xebatA çand û hunerê didomE. Bi taybetî ji bo zarokên şer bandor li wan kirî, xebatA taybet tê kirin.**

Li Rojava, xebatên çand û huner didomin. Bi taybetî jî ji bo zarokên ku şer bandor li wan kiriye, xebatên taybet tên meşandin. Zarok bi xebatên çand û huner, hest û ramanên xwe tînin ziman û li pêy xewn û xeyalên xwe diçin. Şêwekar Hêlîn Ehmed Ebas, li Navenda Çand û Huner a Baqî Xido ya Kantona Kobanê dixebite. Hêlîn mamostetiya zarokan dike.

Şêwekar Hêlîn Ehmed Ebas dibêje, zarokên ku şer li wan bandor kiriye, bi xêzkirina wêneyan hest û ramanê xwe tînin ziman: "Zarok hem bi xêzkirinê bandora şer tînin ziman û hem jî xewn û xeyalên xwe tînin ziman."

**70 zarokan perwerde dike**

Hêlînê di destpêka axaftina xwe de bal bire ser girîngiya wênexêziyê û got, "Ev bû 4 sal ez li Navenda Çand û Huner a Baqî Xido, di beşa wênexêziyê de kar dikim. Her wiha piştî salekê min dest bi perwerdekirina zarokan kir. Hejmara zarokên ku ez wan perwerde dikim niha 70 ye. Ez di du beşan de perwerde zarokan dikim. Şer bandorê li zarokan dike, ji ber vê yekê jî her zaroka ku pênûsa xwe digire serpêhatiyekê vedibêje."



**'Bandora şer li ser zorakan heye'**

Hêlîn dibêje, çi tê serê zarokan, wê xêz dikin: "Ez bi rêya wêneyên ku zarokan xêz kirine, dikarim hest û ramanê wan bixwînim. Lê ez dibînim ku gelek êş û zorî bi serê wan de hatiye. Bi rastî xewn û xeyalan wan di xêzên wan de derdikevin holê. Di wêneyên xwe de jiyaneke pirr xweş û cûda xêz dikin. Zarok siberojê dixwazin bibin mamoste, endezyar, bijîşk û tiştên din. Ev hemû, di xêzên wan de derdikevin holê. Helbet bandora şer jî li ser fikirê zarokan heye. Ji ber ku tevahiya cîhanê zehmetî, êş û azara ku wan kişand, dît."

**'Hêviyên xwe nekujin'**

Hêlîn di dawiyê de dibêje, ew ê heta kêliya dawiyê xewn û xeyalên zarokan bi pêş bixe: "Bi rêya wêneyekî mirov dîrokekê zindî dike, berxwedana gel bi rêya pênûsa zarokan xuya dibe. Ez bang li her jinê, ciwanî û zarokê dikim, xwedî li çanda xwe derkevin û hêviyên xwe nekujin."

*JINHA*

## Ji Tehtika Kobanê re daristanek

**Li rojhilatê Kobanê bi navê "Şehîd Botan" daristanek hat çêkirin.**

Li rojhilatê Kobanê bi navê "Şehîd Botan" daristanek hate avakirin. Desteya Ekolojiyê ya navçeya Şêranê û bi dehan endamên saziyên sivîl ji bo avakirina daristaneke nû ya bi navê şehîd Botan û ji bo xemilandina bajar û gundên ser bi Kobanê, berê xwe dan girê gundê Tehtikê û li wir şitlên daran danîn. Beriya vê jî ji aliyê Desteya Ekolojiyê ya Herêma Firatê ve bi boneya 4'ê Nîsanê 10 hezar dar hatin belavkirin û gelek baxçe û daristan jî hatin avakirin. Li gundê Şêx Çopan 3 hezar dar li ser 7 hektaran hatin çandin û daristanek hate avakirin. Di 21'ê Sibatê de jî li navçeya Sirrînê 2 hezar dar û di 16'ê Adarê de jî li navçeya Çelebiyê 700 dar hatibûn çandin.

*ANHA/KOBANÊ*



## Barana meteoran û Heyva Pembe

**Hefteya li pêşiya me wê barana meteoran ya Lyridsê û Heyva Pembe werin dîtin. Barana meteoran ya Lyridsê û Heyva Pembe wê vê hefteyê li DYE û Ewrûpayê bi şev werin dîtin.**

Hefteya li pêşiya me wê barana meteoran a Lyridsê û Heyva Pembe werin dîtin. Barana meteoran a Lyridsê û Heyva Pembe wê vê hefteyê li DYE û Ewrûpayê bi şev werin dîtin.

Barana meteoran Lyrid wê di 14'ê Nîsanê de dest pê bike û bi qasî mehekê wê stêrk bixuricin. Heta 18´ê Nîsanê di nava saetekê de wê bi qasî 18 stêrkên dixuricin, werin dîtin. Lyrîd her sal di meha Nîsanê de pêk tê. Ev barana meteoran ji ber parçeyên stêrka Thatcherê pêk tê.

Di nava vê mehê de wê Heyva pembe jî bê dîtin. 27 Nîsanê wê mezintirîn heyva çardehşevî ya salê bê dîtin û ew rengên ber bi pembeyî ve nîşan bide.

*Ozgûr Polîtîka*



## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Bac | Diravên ku dewlet di berdêla mal û milk de ji welatiyên xwe distîne: Baca xaniyan pir biha ye. |
| Cirm | Standina bi darê zorê ya mal, milk yan jî diravan ji mirovan: Rêbiran em cirm kirin. |
| Firîşte | Melek. |
| Koordîne (Fransî) | Ji bo xwegihandina armancekê pêkanîna girêdan, têkilî, rêxistin û ahengê di navbera çend karan de: X. karê kargehê koordîne dike. Koordînasyon. |
| Koordînator | Kesê karê koordîneyê pêk tîne. |
| Perû | Xelat, diyarî: A. saetek da B. got; ev perûya te ye. |
| Salewext | 12 meh: X. salewext cotkariyê dike. |
| Seranser | Ji serekî heta serê din. Tev, hemû: Ez li seranserê bajêr geriyam. |
| Seresere | Xemsarî. Girîngnedîtin: X. karê xwe seresere dike. |
| Rojev | Tiştên dibin mijara rojê: Di rojeva me ya îro de êrişên dagîrkeran hene. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | J | Ê | ■ | A | B | ■ | A | R | D |
| 2 | A | L | Î | ■ | E | M | R | ■ | U |
| 3 | R | ■ | N | A | L | ■ | Î | S | A |
| 4 | ■ | A | S | A | ■ | T | ■ | R | ■ |
| 5 | O | ■ | A | ■ | M | E | D | Y | A |
| 6 | D | A | N | K | Î | ■ | U | ■ | Ê |
| 7 | E | W | ■ | E | N | Î | ■ | R | ■ |
| 8 | ■ | A | S | Y | A | ■ | Ş | O | M |
| 9 | | ■ | S | A | K | O | ■ | J | Î |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 2 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 3 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 4 | | | | ■ | | ■ | | | |
| 5 | ■ | | | | ■ | | | | |
| 6 | | ■ | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 7 | | | | | ■ | | | | |
| 8 | ■ | | | ■ | | | | | |
| 9 | | | ■ | | | ■ | | ■ | |

**ÇEP-RAST**

1. Paytexta Sûriyeyê
2. Alet, malzeme... Dengdêrên "pêça"yê
3. Pirç... Beşer, mirov
4. Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropayê... Bajarekî me
5. Beyreq, sembola welatan... Wekhev
6. Tîpên navîn ê "saet"ê
7. Çong... Paytexta Îtalyayê
8. Kurteya elementa Aktînyûmê... Hemû gotin, kirin û çespandinên ji pêxember hatine ragihandin
9. Plakaya navneteweyî ya Îranê... Tûj

**JOR-JÊR**

1. Mektûb... Rastêşek
2. Pêxemberek... Lawaz
3. Hevser (mêrê jinekê)... Navrojê çêrandina pez heta danê esir
4. Xweliya piştî şewatê
5. Ne kevin... Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin
6. Rêxistina polîsan a naziyan... Dirav
7. Cure, celeb... Beşeke malê, jûr
8. Binyata gewdeyê
9. Hejmarek... Peyva neyînî... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin

## 'Hikumeta Şamê Rêveberiya Xweser bi ambargoya li ser gel tehdîd dike'

Qehreman Mamed diyar kir ku hikumeta Şamê tangayî û krîzên politîka xwe ya desthilatdar bi ambargo û zora li ser gel dixwaze veşêre. Herwiha da zanîn ku hikumeta Şamê Rêveberiya Xweser bi bîrçîkirina gel tehdîd dike. R-5



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 957 17-Nîsan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## `Heta Rêber Apo girtî be, wê zilm û zora li cîhanê bidome`

Bêrîvan Yûnis teqez kir ku heta Rêber Apo girtî be, wê zilm û zora li ser gelên cîhanê bidome û got, dewletên serdest naxwazin ti welat û gel xwedîsîstemeke demokratîk bin. Lewra ew dixwazin sîstema xwe ya dagîrker bidomînin. R-5




# BÊDENGÎ HEVKARIYA XIYANETÊ YE



Piştî ku dewleta tirkî ya faşîst 23'ê Nîsana 2021'ê êrişên xwe yên qirkirinê li dijî herêmên parastina medya dan despêkirîn, PDK'ê jî wek salên 1990-1992'yan piştgiriya êrişan kir û pêşmergeyên xwe li pêşiya leşkerên dewleta dagîrker şandin ser nuqteyên gerîlayan. Van rojên davî jî tê zanin ku dewleta tirkî amadekariya êrişeke nû li ser gerilayên azadiyê dike. Rayedarên PDK'e jî bi hemû helwest û tevgera xwe amade ne serkêşiya van êrişên qirkirinê bikin. Li hemberî vê polîtîkaya qirêj gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê nerazîbûna xwe dide diyarkirin û bang dike ku her kesê xwedîexleq û wijdan li hemberî van kiryarên PDK'ê rabe ser piya.

## `Yên Heleb ji terorê parastîn bi dorpêçê tên xelatkirin!`

Hevseroka Meclisa Giştî ya Taxa Şêxmeqsûd û El-Eşrefiyê got, siyaseta birçîkirinê ne cara yekê ye û armanc jê şkandina vîna azad û Neteweya Demokratîk e. Lê emê bi biratiya Kurd, Ereb û Suryanan li ber xwe bidin û ti carî teslîm nebin.R-3



## Civak çiqas' zana be ewqas 'parastî ye

Tevî pêşketina medya dijîtal gelek kes çanda xwendinê ji xwe re bingehp pêşketinê dibînin û dibêjin, ewlekariya civakê girêdayş zanist û hişê civakê ye. R-6



## PDK ji bo caş û enfalkaran bûye stargehek aram

Berpirsên PDK'ê li xwe mukur hatin ku ji bo 258 enfalçiyan û 264 serok caş û misteşaran bûye stargehên aram. R-4



## `Li hemberî PDK`ê û dagîrkeran serî rakin`

Rêveberê Akademiya Civaka Demokartîk diyar kir ku PDK di dîroka xwe de bi dijberiya gelê Kurd û hevkariya dagîrkerên Kurdistanê tê nasîn û bang li gel kir ku li hemberî vê polîtîkaya qirêj serî rake.R-4

## 'Xwedîderketina li zarokên pêwîstiyên taybet xwedîderketina li civakê ye'

Navenda Êrîş ya ji bo Amadekirin û Fêrkirina Zarokan bi xwedîderketina li zarokên pêwîstiyên taybet ji civakê re dibe alîkar. R-6



## Tevgera Çand û Hunera Kurdî ya Ewropa konferansa xwe ya 7an li dar xist

Tevgera Çand û Hunera Kurdî ya Ewropa konferansa xwe ya 7'an bi dirûşma "Li dijî qirkirin û dagîrkeriyê em berxwedana çandî mezin bikin" pêk anî. R-7



## Li girtîgeha Amedê çalakiya greva birçîbûnê dest pê kir

Girtiyên li Girtîgeha Amedê ya Jimar 1, li dijî işkence û binpêkirinên mafan, ji bo 3 rojan greva birçîbûnê dan destpêkirin û bang li rêxistinên civaka sivîl kirin ku li dijî zulma li girtîgehan bêdeng nemînin. R-2

## Adalet Kaya: Tundiya li ser jinê bi veguhertina civakî dikare bê rawestandin

Adalet Kaya rêziknameyên qanûnî yên di derbarê pêşîgirtina tundiyê de nirxand û wiha got ku tundiya li ser jinê ne bi zêdekirina ceza bi veguhertina civakî pêkane. R-3



## Li derve işkence li ser dayîkan li zindanan li ser keç û kurên wan

Dayîkên girtiyan ku xwestin li ber `Edliya` Bakirkoy ya Stenbolê çalakiyê bikin, ji aliyê polîsên Tirk ve hatin lêxistin. R-2

**Nexweşiya Xemsariyê**

Faruk Sakik

*R-4*



# Li derve işkence li ser dayîkan li zindanan li ser keç û kurên wan

Dayîkên girtiyan ku xwestin li ber `Edliya` Bakirkoy ya Stenbolê çalakiyê bikin, ji aliyê polîsên Tirk ve hatin lêxistin.

**Navenda Nûçeyan**

Malbatên ku li Stenbolê ji bo balê bikişînin ser rewşa girtiyên nexweş û girtiyên înfaza wan hatî şewitandin despê çalekiya edeletê kirin û xwestin li ber Edliyeya Bakirkoyê daxuyanî bidin, rastî mûdaxeleya polîsên AKP/MHP'ê hatin.

Çalakiya ku Parlamenterên HDP'ê Alî Kenanoglû û Zeynel Ozen jî piştgirî danê ji aliyê polîsan ve hatin dorpêçkirin. Dayikan bertek nîşanî vê rewşê dan û gotin: "Em dayik in, zarokên me dimirin." Dayik di çalekiyê de rastî êrîşên polîsan hatin û hatin binçavkirin. Herwiha gelek kesên ku xwestin piştevaniya çalakiyê bikin jî bi darbkirinê ji qadê hatin derxistin û derfet ne hat dayîn ku çalekî pêk bê.



## Li girtîgeha Amedê çalakiya greva birçîbûnê dest pê kir

**Girtiyên li Girtîgeha Amedê ya Jimar 1, li dijî işkence û binpêkirinên mafan, ji bo 3 rojan greva birçîbûnê dan destpêkirin û bang li rêxistinên civaka sivîl kirin ku li dijî zulma li girtîgehan bêdeng nemînin.**

Li girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê, li dijî îşkence û pêkanînên xerab her ku diçe grevên birçîbûnê belav dibin. Girtiyên siyasî yên di Girtîgeha Amedê ya Jimare 1'ê de, li dijî binpêkirinên mafan dest bi greva birçîbûnê kirin. Hat ragihandin ku çalakiya greva birçîbûnê îro dest pê kiriye û dê 3 rojan bidome.

Girtiyê bi navê Beran Eman ê 23 salî ku li navçeya Nisêbîn a Mêrdînê di dema qedexeya derketina derve ya di 14'ê Adara 2016'an de hatî îlankirin de, hat girtin û 35 sal û 10 meh ceza lê hat birîn di derheqê îşkenceya di zîndana de û çalekiya greva birçibûnê, bi rêya telefonê malbata xwe re axivî.

### Îşkence û Gef

Eman diyar kir ku di demên dawî de îşkence pir zêde bûye û danê sibehê gardiyan avêtine ser qawîşên wan û belesebeb bela xwe di girtiyan dane û gef li wan xwarine û gotine "Hûn ê hêza dewletê bibînin." Eman, bibîr xist ku di demên dawî de li girtîgehê nêzîkatiyên kêfî yên gardiyanan pir zêde bûne û li Bloka C'yê bi dehan gardiyan girtî Umît Ozkan, Mehmet Kasim Aslan û Dogan Ozbahçeçî ji qawîşê derxistine û birine cihekî kamera lê tune ne û li wir li wan xistine.

### Îşkence bi dawê nebe wê çalakî veguhere greva bêdem

Eman ragihand ku girtiyan



rapora derbkirinê girtine û paşê girtiyan birine qawîşeke din. Herwiha da zanîn ku piştî pêkanînên 14'ê mehê yên danê sibehê, li Girtîgeha Jimare 1'ê ji bo sê rojan greva birçîbûnê destpêkirin e û ger îşkence bi dawî nebin dê greva xwe veguherînin greva bêdem.

Eman, ji bo tespîtkirina pêkanînên li girtîgehê bang li Baroya Amedê, Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê (OHD) û Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) kir ku li hember hovîtiyên girtîgehê erkê xwe pêk bînin.

*ANF*

## Rêveberiya Xweser 10 zarokên çeteyên DAIŞ`ê radestî Rûsya kirin

**Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê 10 zarokên çeteyên DAIŞ`ê yên li Kampa Roj ya li rojhilatê navçeya Dêrikê ya kantona Qamişloyê, radestî hikumeta Rûsya kirin.**

14'ê mehê şandeyeke fermî ya Rûsyayê serdana Daîreya Têkiliyên Derve ya li Qamişloyê kir. Şandeya Rûsyayê ji cîgira seroka Komîseriya Mafên Zarokan a Rûsyayê Elena Alexandrova û cîgirê wê Sergey Igorvich pêk hat. Şande ji aliyê berdevkê Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Kemal Akif ve hat pêşwazîkirin.

Piştî civîna di navbera her du aliyan de, belge û protokolên radestkirinê ji aliyê Elena Alexandrova û Kemal Akif ve hatin îmzekirin.

Piştre, Kemal Akif bi civîneke çapemeniyê dauxyand ku Rêveberiya Xweser îro 10 zarokên çeteyên DAIŞ`ê bi awayekî fermî radestî şandeya Nivîsgeha Parastina Zarokan a Rûsyayê kirine û got: "Heta niha bi awayekî fermî 254 zarok radestî hikumeta Rûsyayê hatine kirin."

Kemal Akif her wiha diyar kir ku Rêveberiya Xweser di vê dosyayê de dê hevkariya bi Rûsyayê û hemû welatên re ku zarokên wan li kampên Bakur û Rojhilatê



Sûriyê re hene, dewam bike û wiha dewam kir: "Li kampên Rêveberiya Xweser zêdetirî 7 hezar zarokên biyanî hene."

Elena Alexandrova, li ser hevkariya di vê dosyayê de spasiya Rêveberiya Xweser kir û diyar kir ku dê hevkarî dewam bike.

*ANHA*

## NEU ji bo Abdullah Ocalan azadî xwest

**Sendîkaya Perwerdeya Neteweyî ya Ingilistanê di kongreya xwe de piştgiriya ji bo kampanya "Ji Abdullah Ocalan re Azadî" ragihand û banga azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kir.**

Li Kurdistan û seranserî cîhanê daxwaza azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan her ku diçe berfireh dibe. Sendîkaya Perwerdehiya Neteweyî (NEU) ku yek ji sendîkayên herî mezin û bi prestîj ên Îngilîstanê ye, piştgiriya xwe ya ji bo kampanyaya 'Ji Abdullah Ocalan re Azadî" ragihand û kongreya xwe ya îsal bi banga azadiya Abdullah Ocalan bi dawî kir.

Bi hezaran delegeyên kedkarên perwerdeyê yên ku di kongreya sendîkayê ya 142'ê mehê de wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên li ser "Freedom for Ocalan" hildan û daxwaza azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kirin.

Di kongreyê de meclîsê bang li hezaran delege kir ku ji bo azadiya Abdullah Ocalan bi hev re rabin ser piyan. Herwiha li salona kongreyê hezar û 700 delegeyan hemwext wêneyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, bi nivîsa "Freedom for Ocalan" hildan û azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan xwestin.

Di kongreya ku li bajarê Bournemouth ê li Başûrê Îngilîstanê pêk hat de, delegeyên sendîkayê yên ji çar aliyê welêt hatin cem hev, gelek rêveberên sendîkayan, parlamenter û nûnerên saziyên sivîl beşdar bûn.

Tê zanîn ku li seranserê Brîtanya nêzî 500 hezar endamên sendîkaya NEU hene.

*ANF*





# Tevgera Çand û Hunera Kurdî ya Ewropa konferansa xwe ya 7an li dar xist

Tevgera Çand û Hunera Kurdî ya Ewropa konferansa xwe ya 7'an bi dirûşma "Li dijî qirkirin û dagîrkeriyê em berxwedana çandî mezin bikin" pêk anî.

Tevgera Çand û Hunera Kurd a Ewropayê di navbera 8-10'ê Nîsanê de, konferansa xwe ya 7'emîn li dar xist. Bi beşdariya 100 delegeyên ji çar aliyên Ewropa û Skandînavyayê û hunermendên mêvan konferans hate lidarxistin

Konferansê ji bo bîranîna hemû şehîdên têkoşîna azadiyê û di serî de ji bo Hozan Mizgîn, Sefkan, Serhat, Halîl Dag, Delîla, Mazdek Ararat ên ji qada çand û hunerê de şehîd bûne bi deqîqeyek rêzgirtinê dest pê kir. Piştre dîwan hate hilbijartin rojeva konfransê hate diyarkirin. Piştî nirxandina geşedanên siyasî yên li Kurdistan û cîhanê, raporên çalakiyan ên qadan hatin xwendin û gotûbêjan dest pê kir. Bi taybetî di van du salên dawî de hemû çalakiyên çandî û hunerî, mîhrîcan, şev, konser, kurs ji hev cuda hatin nirxandin. Hem li ser kêmasiyên derketine holê hem jî li ser rêbazên çareseriyê nîqaşên berfireh hatin kirin. Di her şaxekî hunerê de kar û berhemên derketine, hatin nîqaşkirin, awayê gihandina van berheman ji bo civakê, her weha nêzîkatî û eleqeya gel jî van berheman re jî hatin nirxandin.

Di derbarê konferansê û encamên wê de, ev daxuyanî hate dayîn:

### "Em li dijî qirkirin û dagirkeriyê berxwedana çandî mezin bikin''

Konferansa me ku, me weke Tevgera Çand û Hunera Kurd a Demokratîk a Ewropayê pêk anîbû, bi awayekî serkeftî bi dawî bû. Bi beşdarbûna 100 delegeyên ji çar aliyên Ewropa û Skandînavyayê û hunermendên mêvan konferansa me ya ku di navbera 8-10'ê Nîsanê de bi dirûşma "Em berxwedana çandî ya li dijî komkujî û dagirkeriyê mezin bikin" pêk hat. Konferansa me ya ku tê de asteke girîng a nîqaş, rexne û xwerexnekirinê derkete holê, di demeke ku berxwedana li dijî şerê topyekûn ên hêzên dagirker ên faşîst û hevkarên wan ên ji bo tinekirin û tasfiyekirina Tevgera Azadiya Kurdistanê dimeşînin, bilind bûye de pêk hat. Konferansa me, temamkirin û xurtkirina pêngava me ya berxwedanê di qada çandê de kir armanc xwe.

Ji bo em karibin xebatên xwe yên çandî, hunerî û edebî yên li Ewropayê rast analîz bikin, pirsên ku konferansa me kir û li bersiva wan gerwiya ev bûn:

-Hunerî an jî bê huneriya civaka me di çi astê de ye? Ji bo pejirandina çanda netewa serdest, dûrxistina ji hunerê xwe, dûrxistina huneran e. Di hunerê de mêtingerî çi ye? Derketina li dijî vê çawa bû? Divê berbiçûyineke çawa ber bi hunera şoreşger ve hebe? Ma hunermend dikare bibe kesekî xwe di nava dildariyên şexsî de diqedîne? Hunereke ku gazî azadiyê neke, çawa dikare bibe hunerek şoreşê?

### Di encama lêpirsîna ku me li ser van pirsan pêk anî de, hin mijarên ku derketine pêş ev in.

Berpirsiyariya bingehîn ew e ku moral û rih bi civakê ve bîne. Di navenda modernîteya kapîtalîst de em di bin bandora îdeolojiyên cuda û şêwazên jiyanê yên cuda de ne. Di dîrokê de ji hemû demên din zêdetir êrîş li dijî komcivatan heye. Li dijî rastiya kapîtalîzmê ya ku avahiya nirxên exlaqî û komunal ên civakê perçe dike û li beramberî wê ezezîtiyê har dike, bi şîyara 'civakbuyîn sedema heyîna hunerê ye, ezezîtî jî kuştina huner û hunermend e' hemû cûreyên ezezîtiyê mehkûm dike. Qada ku wê korbûna hestyarî ya ku pergala kapîtalîst di nava gel û civakê de afirandiye, hêdî bike an jî rawestîne, xebatên çand û hunerê ne. Li ser vê bingehê erka me ya herî bingehîn e ku em ruh û moral bidin kes û civakê. Huner jî wekî exlaq rola xercê dileyîze; civakê li hev dicivîne, hevgirtina wê çêdike, bi felsefe û bîrdoziya xwe di civakê de rihê yêkitiyê pêş dixe. Fikir û pîvanan bi dest dixe. Ji ber ku hest û fikrên hunermend di heman demê de rûdana hest û fikrên civakê ye. Divê jiyana hunermend ne li gorî wî, li gorî pîvanên civaka wî û gelê wî bê.

### 'Huner azadiya jinê ji xwe re neke esas bi pêş nakeve'

Xeta me ya çand û hunerê, li ser bingeha nirxên demokratîk û komînal e, li dijî her cure faşîzm, desthilatdarî û neteweperestiyê ye. Di hemû xebat û çalakiyên xwe yên hunerî de avakirina civaka demokratîk esas digire û xeta azadiya jinê geş dike. Xebatên çandî û hunerî yên ku li ser esasê pêşengiya jinê û azadiya jinê nayên kirin, wê her tim kêm bin. Ji bo vê jî divê em di hemû qadên xwe de em xebatê bi perspektîfa jinê birêve bibin.

### 'Divê em xwe bin, ne teqlîdkar bin'

Dema ku em kûr lê dinêrin, yekser dibînin ku felsefeya me ya jiyanê di bin bandora îdeolojiyên din û şêwazên jiyanê yên girêdayî wê de ye. Bi giranî ev bandorên derve ne ku ewqasî me sar, dûbare, bê heyecan û tewandî dikin û bi vî awayî weke kedkarên çand û hunerê me ji erk û berpirsiyariyên me dûr dixe.

Gelekî teqlîdkarî heye, girtina bandora ji derve heye. Ji aliyekî jî di hundirê xwe de ferasetek, rûhiyetek xwe ecibandî heye. Ji aliyekî ve ewqasî xwe ecibandin, lê li aliyê din mayîna di bin bandor derve de, ecibandina wan, daxwaza bûyina weke wan, xwe înkar kirin, ji xwe revîn heye.

### 'Divê berhemên keda kolektîf neyên ferdîkirin'

Yek ji mijarên rojeva konferansa me bû. Niha hinek derketine hewl didin nirxên me yên di paşerojê de di encama jiyan û xebata komînal de derketine holê perçe perçe bikin, li ser hinekan hesab bikin û bixin malê şexsî. Bi gotina "hemûyî filan kes û bêvan kes kir" dixwaze bê gotin ku tevger tune, serokatî tune, şehîd tune ne. Li ser navê Tevgerê Azadiye çi yê komînal hebe tê xwestin bibe malê kesan, li kesan bê par ve kirin û li ser wan nirxan jî nav û deng bê dayin. Divê ji vê dûr bê sekinîn

### 'Divê muzîk û govenda kurdî bê parastin'

Hin prensîb û biryarên konferansê;

Hin prensîb û biryarên ku em ê di xebatên xwe yên paşerojê de esas bigirin ev in:

*Azadiya Rêber Apo weke armancek herî bingehîn a têkoşîna azadî û rûmeta gelê Kurd û hemu gelên azadîxwaz dipejirîne û ji bona vê jî têkoşîneke çalak dide. Vê weke şertê jêneger ê çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd dibîne

*Xebatên çand û hunerê, li dijî qirkirin û asîmilasyona li ser çanda Kurd dibe, xwe bi rêxistin dike, bi xebatên xwe asta têkoşergerî û berpirsiyartiya civakê esas digire.



*Xeta me ya hunerî-çand, çanda me ya Kurdî û nirxên me yên otantîk diparêze. Ji bo ev nirxên me yên çandî û dîrokî di nav hemû dîsîplînên hunerî de bên destgirtin têdikoşe. Bi taybetî wek baweriyên Elewî, Yaresan, Ezîdî ji xwe re dike mijar û li ser kar dike. Dîsa, di nav kar û xebatên xwe de, hemû zaravayên Kurdî bi kar tîne.

*Li dijî her cûre ferasetên nijadperest, lîberal, elîtîst, dewletgir û desthilatdar tekoşîna avakirina pergala me ya alternatîf; konfederalîzma demokratîk dide û xeta çand û hunerê ya komunal û demokratîk esas digire.

*Tevgera Çand û Hunera Demokratîk, li dijî pergala desthilatdariya mêr û ferasetên zayendparêz, sermayedar ku li pêşiya azadbûna jinê dibin asteng, têkoşînê esas digire.

*Ji bo xeta çand û hunerê li dijî ferasetên modernîteya kapîtalîst ên weke nêzîkbûnên ezezî ên hilberîna kolektîf asteng dike, her cûre populîzm, lîberalîzim û dîsa li dijî nêzîkbûnên ku mirovan weke heyberekê pêşkêşî bazarê dike, di xeta çand û hunera azad de têkoşîna komunal û demokratîk pêş dixe.

*Xeta me ya çand û hunerê xweperestiyê weke astenga sereke ya li pêş pêşketin û afirandina hunerê qebûl dike.

*Tevgera me ya çand û hunerê komên bawerî, pêkhateyên etnîkî û hemû nasnameyên çandî yên li ser bingeha civaka xwezayî teşwîq dike ku xwe bi tevahî îfade bikin û ji bo pêşketina wan derfetan peyda dike.

*Xeta me ya çand û hunerê li ser esasê nirxên komunal û demokratîk, li dijî her cûre faşîzmê feraseta netewbûnên desthilatdar, nijadperest û dewletperest, bi rêya civaka demokratîk a rêxistinkirî avakirina netewa demokratîk esas digire û hemû çalakî û xebatên hunerî di xeta azadiya jinê de pêş dixe.

*Tevgera Çand û Hunera Demokratîk, li dijî pergala desthilatdar a ku li ser ciwanan her cure êrîşên xerakirinên ruhî, pûçkirin, biyanîkirina ji nirxên wî yên civakî û dîrokî têdikoşe.

*Ji bo parastina nirxên bingehîn û dewlemendiya muzîka Kurdî perwerde û kampên akademîk organîze dike.

*Ji bo ji nû ve avakirina Şanoya Kurdî li Ewropayê atolyeyan li dar dixe.

*Hewldanên xwe yên ji bo bidestxistina zêdetir temaşevanan ji bo lîstikên komên şanoya Kurdî yên li Kurdistan û Ewropayê didomîne.

*Armanca wê ew e ku li ser vê bingehê ji bo pêşxistina sînemaya Kurdî kolektîfên sînemayê bi awayekî berfireh ava bike, ku bandora sînemayê li ser jiyan û teşekirina çanda civakê gav bi gav zêde dibe.

*Ji bo mezinkirin û berfirehkirina Festîvalên Fîlmên Kurdî û rojên fîlmên ku em li Ewrûpayê li dar dixin, ji aliyê kalîte û hejmarî ve ber bi planên orîjînal ve diçe.

*Ji bo beşdarbûna govendê û rîtmên wê yên di festîval û çalakiyên navneteweyî de xebatên xweser tên meşandin.

*Bi xurtkirina têkiliyên xwe yên bi hunermendên enternasyonalîst, şoreşger û demokrat re xebatên hevpar ên çand û hunerê pêş dikevin.

*Yekîneyên ji bo parastina arşîvan li hemû qadên xebatê û şaxan tên avakirin. Arşîvan veguherîne materyalên nivîskî û dîtbar.

*Biryarên ji bo pêşxistina xebatên Kevana Zêrîn hatine girtin, tên bicihanîn."

*ANF*

# ‘Civak çiqas zana be ewqas parastî ye’

## Tevî pêşketina medya dijîtal gelek kes çanda xwendinê ji xwe re bingehê pêşketinê dibînin û dibêjin, ewlekariya civakê girêdayî zanist û hişê civakê ye.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Di jiyana mirovan de yek ji nirxên herî girîng çanda xwendinê ye (pirtûk, Kovar, Rojname…). Pêşkeftina Zanistê û avabûna kesayetên zana ku pêşengiya civakeke xwedîhiş bike girêdayî çanda xwandinê ye. Lêbelê di van salên dawî de ji ber pêşketina medya dijîtal bandoreke neyînî li çanda xwendinê hatiye kirin. Lê hin kes hene ku qet neketine binê vê bandora neyînî û di kesayeta wan de çanda xwandinê dewam dike.
Têkildarî mijarê hin kesên ku heta niha jî bi xwendinê ve girêdayî ne û karmendên pirtûkxaneya Amara ji me re axivîn û bal kişandin ser girîngiya çanda xwandinê.



**`Çanda xwendinê mirovan ava dike`**

Endamê Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo Mihemed Emîn Îbrahîm ku yek ji kesên bi xwewndinê re eleqedar dibe û ji xwendina pirtûk, kovar û rojnameyan hes dike, da zanîn ku xwendin girîngiyeke wê ya mezin di jiyana mirovan û pêşketina civakê de heye û axaftina xwe wiha domand: “Pêşketina civakê ji xwendinê dest pê dike. Kesên di civakê de çiqas xwedîşehade û di astên jor de bin jî, eger çanda wan ya xwendina şexsî nebe pêşketina wan jî çênabe. Ji bo wê jî xwendina pirtûkan mirovan ava dike û ber bi paşrojeke baş ve dibe. Xwendina pirtûkan nexweşiyên mirovan saxlem dike û gelek pirsgirêkên nava civakê çareser dike. Civaka ku çanda xwendinê tê de pêşketî be, ew civak pêş dikeve û pirsgirêkên wê kêm dibin. Ji bo wê jî xwendin pir girîng e.”

**`Pêşketina medya dijîtal bandor li çanda min nekir`**

Mihemed Emîn da xuyakirin ku tevî pêşketina medya dijîtal, xwendina pitûk, kovar û rojnameyan ji xwe re esas digire û ev li axaftina xwe zêde kir: “Demeke dirêje ez pirtûk û rojnameyan dixwînim û heta niha jî dewama vê yekê dikim. Xwendina qaxezî ji min re pir girîng e. Pêşketina medya dijîtal bandor li çanda min nekir. Ez herî zêde pirtûkên dîrokî, siyasî, yên Rêber Abdullah Ocalan û rojnameyan dixwînim. Çimkî bi xwendina pirtûkên dîrokî û felsefeya rêbertiyê mirov dîroka xwe nas dike.”
Mihemed bîr xist ku ne pêşketina medya dijîtal tenê, bihayê pirtûkan jî pir bilind bûye, lê ev nabe sedem ku mirov dûrî xwendinê bibe. Heriwha got, li herêmên me bi taybetî Qamişlo gelek baxçe û cihên xwendinê hatine vekirin. Kesê ku nikarin pirtûkan bikirin, dikarin biçin li wir pirtûkan bixwînin.
Endamê Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo Mihemed Emîn Ibrahîm di dawiya axaftina xwe de got, ez bi hêvî me di dema pêş de cihên xwendinê hê zêdetir bibin û çivaka me zêde nekeve binê bandora medya dijîtal.



**`Xwendin çareya pêşketinê ye`**

Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Wasil Esed da zanîn ku ne li bakur û rojhilatê Sûriyê tenê, li seranserê cîhanê xwendin rêya pêşketinê ye û wiha berdewamî da gotinên xwe: “Bi rêya pirtûkan mirov gelek agahiyên derbarê dîroka neteweya xwe de nas dike. Çimkî dîroka bi hezarê salan di pirtûkan de hatiye nivîsandin. Heta niha jî zanistên hatîn komkirin di pirtûkan de ne. Herwiha gavên di şoreşê de hatîn avêtin bi xwendinê pêk tên. Ne ji xwendinê bûya, em nedigihîştin vê astê û me şoreş li dar nedixist. Ji bo ku ev şoreş dewam bike û biserkeve, pêwîst e em hê zêdetir lêkolînên xwe bikin û çanda xwendinê di nava gelê xwe de xurttir bikin. Tevayiya şoreş û serhildanên ku bi ser neketîn ji ber nebûna çanda xwendinê bûn. Em niha di şoreşekê de dijîn, ji ber wê jî pêwîstiya me bi xwendinê heye. Ancex em bi xwendinê şoreşê bi ser bixin”



**`Mirov di pirtûkên Rêbertiyê de şexsê xwe nas dike`**

Wasil got, demên berê xwendin pir kêm bû û nezanîn zêde bû. Çimkî şert û mercên em tê de pir zehmet bûn û derfeta xwendinê tinebû. Bi taybetî xwendina bi kurdî tinebû. Lê piştî şoreşê me fikir û felsefeya Rêber Apo jî hê zêdetir nas kir. Ji bo wê jî piraniya pirtûkên ku niha em dixwînim yên Rêbertiyê ne. Mirov di pirtûkên Rêbertî de şexsê xwe nas dike. Bi taybetî pirtûka Neteweya Demokratîk gelek beşên jiyanê pênase dike.

Wasil Esed di dawiyê de got, divê em girîngiyê bidin xwendinê û pêş bixin. Xwendin jî çandek e. Eger em bixwazin vê çandê belav bikin, divê em ji ciwanên xwe dest pê bikin. Çimkî bi ciwanan emê bikarin çanda xwe biparêzin. Ji bo wê jî ez bang li ciwanên bakur û rojhilatê Sûriyê dikim, ku xwe bi xwendinê zana bikin û li şoreşa xwe xwedî derkevin.



**‘Pirtûkxaneya Amara ji xwendevanan re derfet e’**

Karmendê Pirtûkxaneya Amara Mihemed Selîm da zanîn ku gelek cûreyên pirtûkan di pirtûkxaneyê de hene û wiha pê da çû: “Nêzî 15 hezar pirtûkên bi gelek rengên cûda hene. Pirtûkên heyîn bi zimanê kurdî, erebî û ingilîzî jî ne. Li gel me xwendina pirtûkan bê pere ye. Rojane xwendevan tên pirtûkan dixwînin. Xwendevanên ku tên pirtûkxaneyê ciwan û yên temen mezin in.”

Mihemed bal kişan ser bihayê pirtûkan û wiha got: “Piştî ketina nirxê pareyên Sûrî li beramberî dolar, bihayê pirtûkan zêde bûye. Em gelek pirtûkan bi dolar dikirin. Ji ber wê jî xwendevan nikarin pirtûkan ji xwe re bikirin. Niha kirîna pirtûkan pir kêm e. Kesê bixwazin pirtûkan bixwînin li pirtûkxaneyê dema xwe bi xwendinê diborînin.”
Karmendê Pirtûkxaneya Amara Mihemed Selîm di dawiyê de got, deriyê me ji her kesî re vekirî ye. Em bi hêvî ne xwendevanên me zêdetir bibin, da ku çanda xwendinê parastî bimîne.

# ‘Xwedîderketina li zarokên pêwîstiyên taybet xwedîderketina li civakê ye’

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Navenda Êrîş ya ji bo Amadekirin û Fêrkirina Zarokan bi xwedîderketina li zarokên pêwîstiyên taybet ji civakê re dibe alîkar.**

Navenda Şehîd Êrîş ya Zarokên Pêwîstiyên Taybet, bi alîkariya çend mamosteyên pispor xwedî li zarokan derdikeve. Navenda zarokên pêwîstiyên taybet yên ji temenê 10 heta 18 salî dihewîne. Ev dibistane bê pere van zarokan dihewîne û perverde dike.
Têkildarî armanca navendê û xwedîderketina li zarokan, Rêvebera navendê Cînan Ehmed û dayîka zaroka bi navê Dîlan Ebdî jî li ser giringiya navendê û pêwîstiya wan ya bi vê navendên re ji me re axivîn.

**‘Armanc xwedîderketina li zarokên pêwîstiyên taybet e’**



Rêvebera Navenda Êrîş ya Zarokên Pêwîstiyên Taybet Cînan Ehmed diyar kir ku armanca wan ji vekirina navendê pêşxistina wan zarokan e û axaftina xwe wiha domand: “Ji ber ku berî niha navendên wisa li herêmên me tinebûn û zarokên xwedî pêdivî di nava civakê de windayî bûn herwiha malbat jî zehmetiyan bi wan re didîtin, me pêwîstî bi vekirina vê navendê dît, da ku em ji civakê re bibin alîkar û xwedî li zarokên derkevin. Me 13`ê Kanûna 2021`ê navend vekir. Navenda pê pera zarokan digre. Nêzî 10 mamosteyên pispor li navebndê hene û bi zarokan re aleqedar dibin. Jimara zarokan jî 30 ye. Tev yên pêdiviyên taybet in, lê her yek rewşa wî cûda ye, hin jê ker, lal, kêm aqil, dêwis û yên tenêhayî jî hene. Hin jê rewşa wan pir zehmete û hina jî başin. Em wan fêrî pêwîstiyên jiyanê dikin da ku di dema pêş de bê ku kes ji wan re bibe alîkar pêwîstiyên xwe peyda bikin. Herwiha em perwerdeyên derbarê paqijiya şexsî û derdorê didin wan û waneyên werzişê jî didin wan, da ku laşê wan nerim bibe”

**Zehmetiyên danûstandina bi zarokan re**

Cînan Ehmed bal kişand ser rewşa zarokan ya berî niha û piştî hatina wan ya navendê û wiha got: “Destpêka ku zarok hatin rewşa wan pir zehmet bû, ji ber wê jî ne zehmetî bi wan re dikişandin. Lê piştê danûstandinên û alîkariya me bi wan re êdî rewşa wan baştir bûye. heta niha jî em zehmetiyan dibînin, çimkî ne piçûkin, temenê wan baş heye. Ji bo wê jî emê hertim astengiyan bibînin.”

**`Divê malbat jî bi zarokên xwe re alîkar bin`**

Cînan Ehmed di dawiyê de bang li malbatên zarokan kir ku her malbat bi zarokê xwe re alîkar be û got, bandora malbatê jî li ser zarokan pir heye. Divê malbat li gorî rewşa wan danûstandinê bi wan re bikin û ji wan re nebin asteng. Da ku rewşa wan zehmettir nebe.
Dayîka zaroka bi navê Dîlan Ebdî, Sûltan Hemê jî da xuyakirin ku ji dema ev navend hatiye vekirin ew keca xwe Dîlan dibe navendê û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Em pir kêfxweşin ku navendeke wisa li herêma me hatiye vekirin. Pêwîstiya me bi navendeke wisa pir hebû. Berî ku ev navend vebe keça min li mal dima û pir zehmetiyan di jiyana xwe de dikişand û tangaz dibû. Niha pir kêfxweş e û her roj bi dilekî geş diçe navenda xwe. Li navendê mamosteyên wê pir pê re dibin alîkar û wê fêrî gelek tişan dikin.”



Di dawiyê de Sûltan Hemê spasiya tevayiya mamoste û rêveberiya Navenda Êrîş kir ku xwedî li zarokên wan derdikevin. Herwiha daxwaz kir ku di demên pêş de gelek navendên bi vî rengî vebin û ji bo yên temen mezin jî navend werin vekirin.



# `Yên Heleb ji terorê parastîn bi dorpêçê tên xelatkirin!`

## Hevseroka Meclisa Giştî ya Taxa Şêxmeqsûd û El-Eşrefiyê got, siyaseta birçîkirinê ne cara yekê ye û armanc jê şkandina vîna azad û Neteweya Demokratîk e. Lê emê bi biratiya Kurd, Ereb û Suryanan li ber xwe bidin û ti carî teslîm nebin.

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Ligel giranbûna aloziya Sûrî û xerabûna rewşa aborî ya gelên wê, ji 13`ê Adarê ve Hikumeta Şamê dorpêça li ser her du taxên Şêxmeqsûd û El-Eşerefiyê yên bajarê Helebê girantir dike. Hêzên Firqa 4’emîn Yên Şamê ji wê demê ve rê nade ard, xwerak, derman û sotemenî derbasî her du taxan bibe. Ji ber vê dorpêçê 200 hezar mirov ku gelek ji wan koçber in di rewşeke pir xerab de dijîn. Herwisa ev du hefte be ji ber nebûna ard nangeh kar nakin.
Têkîldarî rewşa dawî ya her du taxan Hevseroka Meclisa Giştî ya Taxê Şêxmeqsûd û El-Eşerefiyê, Valentîna Ebdû ji me re axivî.

**`Doh çete bûn û îro hukumeta Şamê ye, armanc yek e`**

Valentîna diyar kir ku ji ber dorpêçkirina her du taxan ji aliyê hêzên hikumeta Şamê ve rewşa tevayiya welatiyan pir xerab e û ev agahî dan: “Lewra welatî tev ji çîna kedkar in û rojane bi karê xwe debar û pêdiviyên jiyanî peyda dikin. Bêguman siyaseta birçîkirinê û dorpêçkirina her du taxan ne cara yekê ye. Ji salên pêşî yên aloziya Sûriyê ve ji aliyê çeteyên Cebhet EL-Nusera yên girêdayî dewleta tirkî ya dagîrker, heman kiryar pêk dihat. Niha jî heman siyasetê ji aliyê Şamê ve didome. Şam bênavber ev sê sal in vê siyaseta hovane li ser her du taxan û herêma Şehba pêk tîne. Ji ber wê gel bi hêrseke mezin li hemberî vê deropêçkirinê nerazîbûna xwe nîşand dide. Siyaseta terbiyekirina gelan bi birçîkirinê nayê qebûlkirin.”

**`Armanca wan têkbirina Neteweya Demokatîk e`**

Hevseroka meclisa giştî ya taxên Şêxmeqsûd û El-Eşerefiyê herwisa diyar kir ku armanca hikumeta Şamê ji vê dorpêçê derxistina tevlîheviyê, têkbirina Projeya Neteweya Demokatîk, şkandina vîna şêniyên taxê û di encamê de xweradestkirina ji wê re ye û helwesta xwe û wiha got: “ Wê ev xewn jê re bibe hesret. Lewra îro di binê sîwana Neteweya Demokartîk de tevayiyê şêniyên her du taxan bi Kurd, Ereb û Suryanên xwe dijîn û serkeftina vê projê diyar dibe. Ji destpêka Şoreşa Rojava ve û heta niha helwesta Şamê her tim dijayetiya Rêverberiya Xweser ya gelan bû, ji ber wê bênavber alozî derxistine. Herwisa bi dopêçkirinê dixwaze rewşa teslîmbûn û vegera bin sîstema xwe li ser gelan pêk bîne. Jixwe bi hezaran xort û keçên me xwe cangoriya jiyana azad û birûmet kirin da ku Heleb ji terorê biparêzin û nekeve. Şermezariya herî mezin ya vê Hikumetê ye ku li şûna berdêlên her du taxan wan bi dorpêçkirinê xelat dike.”

**`Emê li ber xwe bidin, gelê rêxistinkirî wê teslîm nebe`**

Hevseroka meclisa giştî ya taxên Şêxmeqsûd û El-Eşerefiyê Falintîna Ebdû teqez kir ku şêniyên her du taxan girêdayî xwîna şehîdên xwe ne û riya wan dişopînin. herwiha teqez kir ku wê ti carî riya teslîmbûnê qebûl nekin û axaftina xwe wiha qedand: “Emê li ser bingehê Şerê Gel Yê Şoreşgerî yê ku li Rojava cara yekê li Şêxmeqsûd pêk hatî li ber xwe bidin. Jixwe gel xwe nas kiriye û xwe bi rêxistin kiriye, wê ti carî teslîm nebe û ev yek jî bi meşa şermezarkirina vê dorpêçê



ya li taxê pêk hat, teqez bû. Na ji doprpêçkirinê, ne ji siyasetên birçîkirinê, bijî gelên azad. Emê heta dawî li ber xwe bidin. Ji ber wê banga me ji civaka navneteweyî û rêxistinên Mafên Mirovan ku pîvanên xwe pêk bînin. Bila Şam jî bizanibe em beşek ji Sûriyê ne, yên tên dorpêçkirin gelên Sûriyê ne.”

# Adalet Kaya: Tundiya li ser jinê bi veguhertina civakî dikare bê rawestandin

**Adalet Kaya rêziknameyên qanûnî yên di derbarê pêşîgirtina tundiyê de nirxand û wiha got ku tundiya li ser jinê ne bi zêdekirina ceza bi veguhertina civakî pêkane.**

Pêşnûmeya Zagona Guhertina Qanûna Ceza ya Tirk û hin qanûnên ku rêziknameya pêşîgirtina li tundiya li hemberî jinan û xebatkarên tenduristiyê dihewîne ya ku ji aliyê AKP’ê ve ji Meclîsê derket, rojên borî di Komîsyona Edaletê de hat qebûlkirin. Li gorî pêşnûmeyê, hincetên “daxistinê” yên di dozan de tên sepandin dê bên sînorkirin. “Daxistina” cezayê ji ber cil û bergên kiryaran ku di qetlîamên jinan de gelek caran tê rojevê, êdî nayê sepandin. Bi rêziknameya ku di pêşnûmeyê de cih digre dê dadgeh, neçar bimîne ku sedema daxistana ku hatiye kirin di danişînê de nîşan bide. Ger sûcên kuştina bi zanebûn, birîndarkirina bi zanebûn, gefxwarin, îşkence û eziyetkirina li dijî jinan bê kirin dê cezayê wî bê girankirin. Bikaranîna sûcê kuştina bi zanebûn a li hemberî jinan dê di nava dozên bi wesf ên vî sûcî de cih bigre. Gava ku cezayê kuştinê bi qestî cezayê muebetê be ger ev sûc li dijî jinan bê kirin dê cezayê bê dayîn bibe cezayê muebeta girankirî.

**“Rêzikname ne samîmî ye!”**

Seroka Komeleya Jinan a Rosa Adalet Kaya, biryarên ku piştî derketina Tirkiyeyê ji Peymana Stenbolê bi rêziknameya nû hatine girtin nirxand, diyar kir ku ew rêziknameyên ku hikûmet ji peymanê vekişiyaye dike samîmî nabînin. Adalet Kaya, anî ziman ku tundiya li ser jinê bi zêdekirina cezayên di rêziknameyê de tê xwestin bi dawî nebe û got ku tişta herî girîng a divê hikûmet bike veguherandina civakê ye. Adalet Kaya balkişand ser wê yeke ku cezayên tên dayîn ji bo mêran bandorker nabe.

**“Hikûmet îradeyeke rast nîşan neda”**

Adalet Kaya diyar kir ku hikûmeta ku ji Peymana Stenbolê vekişiya, ji bo polîtîkayên pêşîlêgirtinê yên li hemberî tundiya li ser jinê îradeyeke rast nedanî holê û diyar kir ku ev guhertina ku bi zagona cezayê re dihat xwestin bê kirin, bi nêzîkatiyeke çav boyaxkirine re hatiye sazkirin. Adalet Kaya da ziman ku kêmasiya herî mezin a rêziknameyê beriya naverokê nebûna nêrînên akademîsyen, rêxistinên sivîl û kesên ku rasterast bi têkoşîna jinê re têkildar in û destnîşan kir ku qanûna ku ji kirdeyên mijar serbixwe hatiye amadekirin, tu tişt îfade nake.

**“Qanûnên rêziknameyê ji xwe di Peymana Stenbolê de hebûn”**

Adalet Kaya anî ziman ku zêdekirina cezayên ku di rêziknameyê de hatine hedefgirtin dê bandorêk teximker li mêran neke û destnîşan kir ku divê di serî de li dijî tundiya li ser jinê guherîn û veguherîna civakî pêk were. Adalet Kaya axaftina xwe wiha domand: “Dema em rêziknameyê hati çêkirin lêkolîn dikin, em dibînin ku; ji bo sûcên tundiya li ser jinan hinek cezayên zêde hatine pêşbînîkirin. Di rastiyê de, ev jixwe di qanûna cezayê de heye û di nava xalên Peymana Stenbolê de jî hebûn. Em dizanin ku ev bi awayekî bandor nayên sepandin û ji ber nêzîkatiyên ku ji aliyê darazê ve wekheviya zayendî pêş naxe tê pêşbînîkirin, ji ber ev polîtîka ku em jê re dibêjin polîtîkaya bêcezatiyê tu bandorek teximker ya van cezayên li ser civakê nîne. Di vî warî de divê pêkanînên cidî yên di asta civakê de bên bicihanîn ku bandora pêvajoya li tundî û kuştinên jinan ên tên jiyîn bibe.”

**“Şopandina bi israr tundiya sîstematîk e”**

Adalet Kaya bal li ser kişand ku xala şopandina bi israr a di vesazkirinê de cih digre ji xwe di Qanûna Cezayê ya Tirkiyê de cih digre lê belê nayê pêkanîn û wiha got: “Em dibînin ku tişta ku em jê re dibêjin ‘daxistina teşwîqê’ ya neheq, ferasetên ku ji dawa kin heyanî axaftina jinan tê pênasekirin bandorê li ser biryarên darazê dike. Îro dema ku di vê rêziknameyê de derbarê daxistina tehrîk ya bêheq tu tiştek nehat kirin, hin pêkanînên wekî daxistina bi feraset qedexe dike, lê em weke tevgera jinan her tim gotiye ku ji xwe divê ev tişt nebin. Dema ku em li naverokê dinêrin, di derheqê şopandina bi israr de rêziknameyek heye. Wiha hewl dide şopandina bi israr jî bike nava pergala cezakirinê, lê em dikarin li ser vê yekê wiha bibêjin; Ev xal ji berê ve hebû, lê nehat bicihanîn. Ji bo pêkanîna vê yekê jî tevgerên jinan demeke dirêj xebat meşandin. Şopandina bi israr tundiya sîstematîk e. Ev jî di xala 96’an a TCK’ê de hatiye birêkûpêkkirin, lê nayê bicihanîn.”

**“Heta ku yasa neyên bicîh anîn rêziknameya nû zêde tişt nade guhertin”**

Adalet Kaya bal lê kişand ku pêwistî bi sazkirina nû ya di nav zagonên heyî de nîne û got “Rûxmê ku tê zanîn pêkhênerên zagonî xalên heyî pêk naynin, em ji xwe dizanin ku wê sazkirinên nû pir tiştekî neguherin”.
Adalet Kaya bi bîr xist ku zêdekirina cezayê sûcê bi taybetî jî mêran ji pêkanîna vî sûcî teximker neke û wiha got: “Tirkiye di şevekê de bi awayekî bêhiqûqî ji Peymana Stenbolê vekişiya. Dema ku li ser pêkanîna peymana têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê, derbasê jiyane kirin de û derbarê newekheviya zayendî ya civakî xebat neyên meşandin, em îro bi zêdekirina cezayan nêzîkatiya wekî “em ê pêşî li tundiya li ser jinê bigirin” bêsamimî dibînin. Ji ber ku niha ne tenê di peymanê de, di qanûna bi hejmara 6284 a TCK’ê de jî li gorî vî gelek rêzikname hene. Û ev jî nayên bicihanîn.

**“Di darazê de li dijî jinan nêzîkatiyeke dijminatî heye”**

Adalet Kaya, bal kişand ser daxistina tehrîk ya nehiqûqî ya di rêziknameyê de cih digre jî û got: “Em li biryara dawî ya Hatîce Kaçmaz a ku ji Dadgeha Bilind derket binêrin; tevî ku kuştina bi qestî gelek zelal bû jî, darazê ev wekî ji bo zewac qebûl nekir, weke tehrîka neheq nirxand û di cezayê de çû daxistinê. Bi vê biryarê re me dît ku daraz bi nêzîkatiya baviksalarî



û dijminatiya jinên sûcên li dijî jinê çawa dinirxîne. Di darazê de li dijî jinê nêzîkatiyeke bi vî rengî ya dijminatî heye. Ji dadgehên herêmî jî biryarên wiha derdikevin. Di dema ku ji bo mêrên ku jin qetil dikin daxistina tehrîka neheq tê dayîn, li wir tu carî tehrîka neheq neket sererast kirine. Ev tiştek e ku divê di qanûnê de qet nebe û hîna jî heye. Divê hemû sûcên li dijî jinan tên pêkanîn, dîsa li derveyî lihevhatine be.”

**“Tişta ku divê were kirin mîsogerkirina veguherîna civakî ye”**

Adalet Kaya herî dawî wiha got: “Zêdekirina ceza sûc kêm nake. Yek ji tişta herî girîng ya ku ev hikûmet bike veguherîna civakî mîsoger kirine. Li dijî newekheviya zayendî têkoşîn kirine. Ji xwe cezayekî ku bi rêjeyek zêde tê dayîn mêran naseknine. Em dibînin ku ji sedî 20’ê cezayên ku ji ber sûcên li dijî jinan tên dayîn, tên pêkanîn. Bi u awayî bi daxistinan û sêpanan mêr di girtîgehê de namînin. Bandora wê ya texîmker jî nabe.”
***JINHA/AMED***

# `Li hemberî PDK`ê û dagîrkeran serî rakin`

Rêveberê Akademiya Civaka Demokartîk diyar kir ku PDK di dîroka xwe de bi dijberiya gelê Kurd û hevkariya dagîrkerên Kurdistanê tê nasîn û bang li gel kir ku li hemberî vê polîtîkaya qirêj serî rake.

**Serbest Etê/Qamişlo**

Li ser pêvajo û geşedanên li Kurdistanê û helwesta PDK`ê, rêveberê Akademiya Ş.Luqman ya Civaka Demokartîk ya bajarê Qamişlo Mûsa Xelîl ji me re axivî.

**`Bi nav û kincên kurdîtiyê serkêşên PDK`ê gel dixapînin û projeyên dijmin li welat pêk tînin`**

Rêveberê Akademya Civaka Demokratîk diyar kir ku PDK û şaxên wê di dîrokê de, li her çar parçeyên Kurdistanê bi stratejiya parçekirina gelê Kurd û hevkariya dagîrkeran tev geriyaye û ev nirxandin kir: "Dema em li dîrokê dinêrin ev teqez dibe. Stratejiyeke wisa ye ku li ser hesabê doza gelê Kurd berjewendiyên şexsî, malbatî û xanedanî hildibijêre. Li ser vî bingehî her tim girêdana xwe bi dijmin û dagîrkerên Kurdistanê re çêkiriye. Li aliyekî din hevkariya wan kiriye û di tevayiya kompoyên wan yên li ser gelê Kurd de cî girtiye. Serkêşên PDK`ê, bi nav û kincên kurdîtiyê gel dixapînin û li welat projeyên dijmin pêk tînin."

**`PDK amûra dijmin ya li dijî tevgerên azadiya gelê Kurd e`**

Mûsa Xelîl herwisa diyar kir ku PDK bi dijîtiya tevger û hêzên Kurdperwer û azadîxwaz navdar e û ev 40 sal in de bi dewleta tirkî ya dagîrker re şerê Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd PKK`ê dike û axaftina xwe wiha domand: "Tevgera Azadiyê bi xebat û têkoşîna 50 salî dixwaze zincîr û sînorên dijminan li ser gelê Kurd danîn, bişkîne û gelan azad bike. Lê di dirêjayiya vê xebatê de PDK`ê hevkariya dijmin kiriye û bi dijmin re li qirbûna gelê Kurd geriyaye. Roleke wisa dagîrkeran spartiye wê ku ti hêzên azadîxwaz yên Kurd nehêle yan jî wan bixin binê sîwana xwe û li gorî polîtîkayên dijmin wan tev bigerîne. Herî dawî PDK amadakariya şer ser qadên gerîla dike û tevlî konsepta qirkirina civaka Êzîdî dibe. Xweseriya Civaka Kurdên Êzîdîku li ser wan bi dehan ferman û komkujî pêk hatine- dike amanc. Îro hêzên ku xwedîrol bûn di qirkirina 2014`an ya li ser Êzîdiyan de, PDK, hikumeta Bexdayê û dewleta tirkî ya dagîrker dîwaran li hawîrdorû Şingalê datînin, dixwazin vê civakê bifetisînin û wan ji cîhanê qut bikin. Bi destê PDKê û hikûmeta Iraqê dîwarên şermê tê avakirin. Diyar e PDK hebûna desthilata xwe û berjewendiyên malabatî yên teng li ser parçe û tinekirina gelê Kurd diparêze."

**`Serî rakin dem dema yekîtiya gelê Kurd e`**

Rêveberê Akademiya Civaka Demokatîk ya Ş. Luqman ya bajarê Qamişlo Mûsa Xelîl teqez kir ku gelê Kurd van kiryar û helwestên PDK`ê ku dikevin xizmeta dagîrkeran qebûl nake û axaftina xwe wiha qedand:" Em êriş û polîtîkayên dewleta tirkî ya dagîrker û PDK`ê yên hemberî Tevgera Azadiyê û avakirina sînor û dîwaran di navabera Rojava û Şingalê de qet qebûl nekin. Emê her tim li her çar parçeyên Kurdistanê li hemberî wan, ser piyan bin û bibin xelek li derdora hêzên xwe. Banga me ji gelê Kurd û gelên herêmê re ew e ku serî rakin. Dema dem yekîtî û pêşketina gelê Kurd e, dema şkandina sînorên di navbera gel û civakan de ye, dema gelan e."



# PDK ji bo caş û enfalkaran bûye stargeheke aram

**Berpirsên PDK'ê li xwe mukur hatin ku ji bo 258 enfalçiyan û 264 serok caş û misteşaran bûye stargehên aram.**

Li ser jenosida enfalê re 34 sal derbas bûn. Hîn di qada navneteweyî de weke jenosid nehatiye naskirin û gunehbar nehatine cezakirn. Di heman demê de li gorî mikurhatina berpirsên PDK'ê desthilata Başûrê Kurdistanê, taybet PDK ji bo 258 enfalçiyan û 264 serok caş û misteşaran bûye stargehên aram.

Li Başûrê Kurdistanê enfala di 8 qonaxan de pêkhat de, di navbera 23'yê Sibatê heta 6'ê Îlona 1988'an de bi rêveberiya Elî Hesen Mecîd ê pismamê Serokkomarê wê demê yê Iraqê Sedem Hisên, piraniya gund û bajarên Başûrê Kurdistanê hatin wêrankirin û li gorî daneyên hikûmeta Herêma Kurdistanê 182 hezar kes hatin qetilkirin. Bi hezaran jin, zarok, ciwan û mêr birin çolistanên Iraqê, bi saxî binax kirin. Li ser vê komkujiyê re 34 sal derbas bûn. Lê, tişta sosret ewe ku heta îro yek ji wan yên ku di vê enfalê de rol listî nehatine cezakirin, di himbêza hikûmeta Kurdî de bi aramî dijîn û wezîfe û erk girtîne.

**Mikurhatina enfalçiyan**

Di 20'ê Gulana 2008'an de Dadgeha Bilind a Sûcên Iraqê, fermana girtina 423 sûcdarên enfalê da ku ji Cîgirê Îstixbareta Giştî Wefîq Ecîl Samerayî, Welîd Nayif û rêveberê Hobeya Bakûr Şebîbî, Sekreterê Serokkomar Hamid Yusif Hemadî destpê dikir û heta Mihemed Îsa Pîrweyis Caf, Mihemed Seîd Ehmed Mihemed Hewramî bi dawî dibû. Ji vane tewanbaran niha 258 li Herêma Kurdistanê jiyan dikin ku ji Mihemed Kerîm Şûş Zêbarî û Xurşîd Eshed Resûl destpê dike û bi Şêx Mecîd Bayiz Hesen û Selahedîn Xidir Resûl bi dawî dibe.

**Ji bo sûcdaran pêşkêşkirina wezîfe û erk**

Dadgeha Sûcan a Iraqê, lîsteya 264 ên hatîn xwestin ên serok caş û misteşaran ji bo Herêma Kurdistanê şand, lê di wî warî de ti şopandin nekir û ti kes nehatin girtin. Niha herî zêde serok caş û misteşar li Hewlêrê ne. PDK li xwe mikur hat ku, li gorî daneyan ji 156 serok caş û misteşaran, 29 kesan pileyên bilind ên wezîfeyên leşkerî, hizbî û hikûmî hene.

Nivîskar û Lêkolînvanê Enfalê Simko Sabîr, têkildarî tevlîbûna caşan a di jenosida enfalê de wiha di axive: "Li Kurdistanê 263 fewcên caş hebûn. Her yekê misteşarekê serpereştî dikir. Di nava caşan de rêveberê bilind hebû. Herwiha du curên din ên caşê hebûn. Yek fewca tewarî, ya din jî fewca îstixbaret. Caşan di enfalê de rolek metirsîdar hebû, li gel rejîmê ew cihên nepanî û veşartî, kevin ku xelkê ji bo xweveşartînê bi kar dianîn, Baasê nedizanî, caşan eşkere dikir. Vê jî wiha dikir ku qurbanî gelek zêde bibin."

Endamê Polîtburoya Partiya Demokratîk a Kurdistanê (PDK) Kakemîn Necar di 22'yê Îlona 2021'an de di mîtînga propagandakirina hilbijartina Iraqê de axivî û mikûr hat ku Baasî û kujerên Kurdan weke 'Enfalkar' tên zanîn li Hewlêr hatine hewandin ku destê wan di qetilkirina hezaran kesan de hene.

**'Ji aliyê me ve nehatine efûkirin'**

Enwer Hemelaw yek ji şahdinên enfala li Germiyane li ser vê yekê wiha tîne ziman; "Ew caş û misteşarên ku ji aliyê desthilata Kurd ve tên parastin, ji aliyê me ve nehatine efûkirin, divê rojekê werin dadgehkirin. Ewane komek xelkê xwefiroş û sitemkar in. Em li ser vê dosyayê berdewam in. Eger ev hikûmeta têkçûyî jî nebe, rojekê wê yasa serwer bibe. Divê werin dadgehkirin û cezakirin."

**'Dosya enfalê hîn zindî ye'**

Herwiha Serokê Yekîtiya Nivîskarên Jenosidê Salar Mehmud got: "Piştî 34 salên enfalê, hîn dosya wê vekiriye û zindî ye. Divê dadgeha bilind a sûc were zindîkirin û dest bi kar bike. Ji bo ku hemû kesên hatine xwestin biçin li ber dadgehê. Ev ê li pêşiya duberebûna jenosidên mîna vê bibe astengiyek mezin. Heta niha sedema necezakirina wan xemsariya hikûmeta Herêma Kurdistanê ya li beramberî enfal û dosya jenosidê ye. Beşek din jî sedemên siyasî û civakî ne. Beşek jî kesên tevlî bûne cihek wan ê civakî heye. Li gorî eşîra wan û coxrafya wan a cuda hizb wan li ber çav digirin. Herwiha di nava raya giştî de, ji bo dadgehkirina sûcdarên enfalê zextek giştî çênebûye. Herwiha beşek ji wan parastîne."

Herwiha têkildarî bandoriya parastina caş û misteşaran Salar Mehmûd got: "Li ser asta hizbî parastîne, ev jî ziyanek mezin li dosya jenosidê, mijarên nîştimanî û ihtimana dubare nebûna jenosidê dide. Lê wê heta heta ev dosya vekirî bimîne û wê rojek were ku çareser bike."

***ROJNEWS***






## Nexweşiya Xemsariyê

**Farûk SAKIK**

Komîteya Têkiliyên Derve ya KCK'ê 26'ê Adara 2022'yan bi daxuyaniyekê ragihand ku wê dewleta Tirkan ya dagîrker bi hevkariya PDK'ê êrişekê li dijî başûrê Kurdistanê pêk .bîne

KCK›ê dema dîtibû PDK hêzên xwe sewqî Herêmên Parastinê yên Medyayê dike ev daxuyanî dabû. Her sal di destpêka biharê de em vê liv û tevgerê dibînin. Û her sal li hemberî tevgerên dawî yên hêzên PDK'ê gelê Kurdistanê, siyasetmedar, rewşenbîr û tevgerên jinan bertek nîşan didan lê PDK'ê ji .helwesta xwe gavek paş ve nedavêt

Dema KCK›ê ev daxuyanî da, rojek du roj di rojevê de ma û hat jibîrkirin. Û di nava Kurdan de xemsariya ku wek nexweşî ye dîsa dest pê .kir

Dîsa bihar e û dîsa hewldanên êrişa dewleta Tirkan ya dagîrker ya ser Herêmên Parastinê .yên Medyayê bêsekin dewam dikin

Hedefa yekê ya dewleta Tirkan bi hemû hêza xwe hewl dide ku gelek deverên Herêmên Parastinê yên Medyayê dagîr bike. Lê wek di sala 2021›an de jî me dît, her tim li hemberî .berxwedana lehengî ya gerîlayan têk diçe

Piştî van têkçûnan hin hedefên nû wek Rojava, .Mexmûr û Şongal dide pêş xwe

Herî dawî, dewleta Tirkan hewl dide sûdê ji nakokiyên şerê li Ukraynayê bigire û vê .fersendê li gorî berjewendiyên xwe bi kar bîne

Şerê li Ukraynayê bandoreke mezin li Şerê Sûriyê jî dike. Ji ber van sedeman Tirkiye bi rejima Şamê re ketiye nav danûsandinan.

Di van rojên dawî de gelek desteyên Tirkiyê li Şamê û li hin navendên din bi îstixbarata .Sûriyê re di nav danûsandinan de ne

Herî dawî di 13›ê Nîsanê de nivîskarê rojnameya Cûmhurriyet Mustafa Balbay di nivîsa xwe de digot; li Enqerê li Qesra Erdogan ji bo lihevhatina bi Sûriyê re amadekariyek heye.

Dîrek destpêkirina têkiliyên ku 10 sal in qût bûne ne hêsan e di rojek de ji nû de dest pê bikin. Ji bo vê yekê formulek hat dîtin, wê bi têkiliyên mirovî-însanî dest pê bikin. Balbay, roja cejna Remezanê jî wek ihtîmala roja .destpêkirina têkiliyan destnîşan dike

Di hevdîtinên navbera her du aliyan de, ji bo ku di siyasetê de vegerin kodên xwe yê berê, dewleta Tirkan yek şertî dide pêş Şamê; bidawîanîna rêveberiya xweser a Bakûr-.Rojhilatê Sûriyê

Di demek wiha de, ji 13`ê Adarê ve li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dorpêç û ambargoyek dest pê kir. Ev ne tesaduf e. Ev ambargo bi .pêşketinên demê re girêdayîne

Eniyek din jî, îzolekirina herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Hikumeta Mistefa Kazimî bi hevkariya PDK`ê ji meha adarê ve di navbera Şingal û Rojava de dest bi lêkirina dîwar kir. Bi lêkirina dîwar dixwazin gelê herêmê ji hev qut bikin. Ev hewldan jî li ser daxwaza .dewleta Tirk a peymana Baxdayê ye

Em vegerin destpêkê û nexweşiya xemsariyê. Her wek herkes li bendê be ka wê çi biqewime. Ji niha de tu midaxleyek nayê kirin da ku pêşî li vê metirsiyê bigirin. Hin tişt hene ji îro de neyên kirin wê bibin sedemên ziyanên .mezin

Ew înîsiyatîfên sala par ji hunermend, rewşenbîr, siyasetmedar û ji gelek beşên civakê hatibûn avakirin dive demildest bikevin nav tevgerê. Bilêtên xwe yên çûyina Hewlêrê diviya piştî daxuyaniya KCK'ê rezervasyon kiribûna. Hespê xwe zîn kiribûna û birêketibûna. Weke gelek caran mixabin pir û pir dereng man. Hin kes ji niha ve resmê kevokek guliyê zeytûnê di dev de ku aştiyê sembol dike, çêdikin da ku piştî şer destpêkir, ew jî dakevin qadan û aştiyê biqêrin. Eybe.. Heger şer dest pê bike û yek gerîla jî şehîd bikeve em ê çawa li rûyê hev binêrin. Ev ‹nexweşiya .xemsariyê› şermek pir mezin e



# 'Hikumeta Şamê Rêveberiya Xweser bi ambargoya ser gel tehdîd dike'

Qehreman Mamed diyar kir ku hikumeta Şamê tangayî û krîzên politika xwe ya desthilatdar bi ambargo û zora li ser gel dixwaze veşêre. Herwiha da zanîn ku hikumeta Şamê Rêveberiya Xweser bi bîrçîkirina gel tehdîd dike.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Têkildarî rewşa gelê taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê ku ev demek e ji aliyê hikumeta Şamê ve ambargoyeke giran li ser wan hatiye danîn û armanca vê ambargoyê, hevserokê ofîsa ragihandin û lêkolina PYD Qehreman ji me re axivî.

Qehreman diyar kir ku, ji ber ku her du tax cihên wan stratejîk in, ji hemû hêzên serdest re dibin amanc. Qehreman axaftina xw wiha domand: "Sûriye bi giştî di şerekî dijwar re derbas dibe, bi taybetî bajarê Heleb û bi taybetî taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê. Lewra ev her du tax cihekî stratejîk e û dibe amanca hemû hêzên serdest. Yek jê çeteyên girêdayî dagîrkeriya tirkî ne. Dixwazin van her du taxan bigirin destê xwe, da ku bajarê Helebê dagîr bikin. Di heman demê de hikumeta Şamê jî dixwaze vî tiştî bike. Lê bi saya berxwedana hêzên me yên leşkerî (YPG), (YPJ), Asayîş û berxwedana gel, ev plan têk çû."

**'Hukumeta Şamê gelê ji dagîrkeriya tirkî revîn bi bîrçîbûnê terbiye dike'**

Qehreman da diyarkirin ku hikumeta Şamê şuna aloziyên li Sûrî çareser bike gel tangav dike û ambargoyê datîne ser gel û wiha domand: "Hikumeta Şamê di milê leşkerî û siyasî de şkestiye, ji ber wê dixwaze bi ambargoyê tola xwe ji gel rake. Ji xwe gelê me yê li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê piraniya wan ji bajarê Efrînê ne. Herwiha ji bajarê Helebê jî hene. Tevayiya gelan di van her du taxan de dijîn. Lewra hikumeta Şamê bi riya ambargoyê û qedexekirina derbaskirina madeyan, astengiyan ji gel re çêdike û dixwaze her du taxan bixe bin kontrola xwe."

**'Şuna bi Rêveberiya Xweser re li çareseriya aloziyê bigere, Rêveberiya Xweser bi ambargoya li gel re tehdît dike'**

Qehrman da zanîn ku rêjima Şamê ambargoya li ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê wek kartekê li dijî Rêveberiya Xweser bi kar tîne, da hin armancên siyasî yên dewletê dagîrker bi dest bixe û axaftina xwe wiha domand: "Hikumeta Şamê taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê mîna kartekê li dijî Rêveberiya Xweser bi kar tîne. Çawa ku zivistanê mazot û pêdiviyên jiyanê li ser xelkê me qut kirin, niha jî ard ku madeya herî girîng di jiyana mirovan de ye, qedexe dike. Wekî em dizanin ku mazot, ard, nan û dermanên nexweşiyan gelek girîng in ji bo gel, ji ber wê rêjim derbasbûna van madeyan qedexe dike. Mirov li hemberî kiryarên rêjimê matmayî dimîne, çawa dewletek li ser gelên xwe emabargoyê datîne. Kiryarên rêjimê wekî yên çeteyan in. Ev kîryare ji exlaq û nirxên mirovayiyê pir dûr in. Siyaseta rêjimê ji her kesî re eşkere bûye, kiryarên hêzên desthilatdar jî, herdem ji bo berjewendiyan in."



**'Gel van êriş û plana baş nas dike û armanca tekoşina xwe jî baş nas dike!'**

Hevserokê ofîsa ragihandin û lêkolîna PYD Qehreman Mamed bal kişand ser berxwedana gel ya li taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û axaftina xwe wiha qedand: "Gelê me bi berxwedana xwe tê nasîn. Gelek caran me êriş û planên dijminê xwe ditîne û me şkandine. Emê bi rihê şerê şoreşgerî yê gel li ber xwe bidin û tevayiya êrişan bêbandor bikin. Ti carî wê nikaribn îradeya gelê me bişkînin. Tevayiya gelên ku di binê sîwana Rêvberiya Xweser de dijîn, bi hev re wekî laşekî ne û piştgiriya hev dikin."

# `Heta Rêber Apo girtî be, wê zilm û zora li cîhanê bidome`

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Bêrîvan Yûnis teqez kir ku heta Rêber Apo girtî be, wê zilm û zora li ser gelên cîhanê bidome û got, dewletên serdest naxwazin ti welat û gel xwedîsîstemeke demokratîk bin. Lewra ew dixwazin sîstema xwe ya dagîrker bidomînin.**

Li dijî tecîrda giran ya ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan, gelê Kurd herwiha gelê azadîxwaz, çalakiyan didomînin. Dewleta tirkî ya dagîrker ji bo ku fikir û felsefeya Rêber Ocalan ji holê rake, hemû rêbazên li dijî mirovatiyê bi kar tîne. Mîna tecrîda ser Rêber Apo dagîrkirin, kuştin, revandin, qirkirin û talankirina mal û milkê gelê Kurd.

Ji bo rakirina tecrîdê û azadiya Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan gelê, Kurd û gelên azadîxwaz bi siyasetmedar, hunermend, nivîskar û tevgerên jinan, li seranserê cîhanê li ser piyan in. Herî dawî 25'ê Adara 2020'an Rêber Abdullah Ocalan bi telefonê bi birayê xwe re Mihemed Ocalan re axivî. Wê demê peywendî piştî 5 deqeyan hat qutkirin. Piştî vê peywendiyê ti agahî ji Rêber Apo nehatine girtin.

Rojnamevana JIN TV Bêrîvan Yûnis di derheqê tecrîda heyî û armanca dewleta tirk de ji me re axivî û destnîşan kir ku, fikir û felsefeya Rêberê gelan Rêber Apo kilîta çareserkirina pirsgirikên heyî ye. Bêrîvan axaftina xwe wiha domand: "Gel û kesên ramanên Rêbertiyê nas kirine, gihiştine wê baweriyê ku, pirsgirêkên Rojhilata Navî ancex bi ramanên Rêber Apo çareser bibin. Lewra fikrekî demokratîk e û li dijî desthilatdariyê ye. Ji ber vê yekê dewleta tirkî ya dagîrker ev demeke dirêj e tecrîda ser Rêber Apo giran dike. Lê em dibêjin ew nikarin û wê nikaribin gelê Kurd ji felsefeya Rêbertiyê qut bikin. Lewra felsefeya Rêberê gelan Rêber Apo bûye beşa herî girîng ya jiyana me."

**`Wê bi saya ramanên Rêber Apo mafê gelan were parastin`**

Herwiha Bêrîvan li ser Komploya Navneteweyî jî wiha got; "Çîroka komployê diyar e, rola dewletên navneteweyî jî tê de diyarde bû. Bi armanca qutkirina gel ji Rêber Apo bi dehan dewletên desthilatdar di nava Komployê de cî girtin û pêk anîn. Lê di dema me ya niha de gelek tişt hatin guhertin. Ev ne salek û dudu ne, bi dehê salan e gelê Kurd li ser ramanên Rêbertiyê kar û xebatê dike. Êdî bila dewletên cîhanê tev bi taybetî dewleta tirkî, baş bizanin ku bi ti rêbazan nikarin Rêbertiyê ji gelê Kurd û yê azadixwaz qut bikin. Çimkî Rêber Apo ne Rêberekî normal e, lewra felsefeya Rêber Apo li cîhanê tevê hatiya belavkirin û bûye hêviya gelan. Niha pirtûkên Rêbertiyê di zanîngehê cîhanê tê xwendin û nifşên nû li ser ramanên Rêbertiyê tên perwerdekirin. Ev yek tê wê wateyê ku, ramanên Rêbertiyê wê mafê me yê gelê Kurd û yê gelê bindest biparêze."

**`Felsefeya Rêber Apo bingehê hilweşandina desthiladaran e`**

Bêrîvan got, piştî şoreşa Rojava û pêkanîna projeya Rêveberiya Xweser, gelek kesên serbixwe û yên naskirî ji gelek welatan serdana bakur û rojhilatê Sûriyê kirin. Piştî dîtina wan ya projeyê Neteweya Demokratîk, êdî nema dikarîn çavên xwe li ser heqîqetê bigirin. Ji ber wê dadgehên navneteweyî nema dizanin çawa pirsgirêka ya wan bi destê xwe çêkirî, çareser bikin.

Bêrîvan wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ne gelê cîhanê ji bo rakirina tecrîdê bêdeng e, hêzên serdest yên ku cîhanê bi rêve dibin, bêdeng in. Ev bêdengiya wan rastiya wan ya li hemberş çareseriya bêhuquqî ye. Çawa sedsala 21`ê dewletnetew ber bi têkveçûnê ve diçe, eger li xwe venegerin wê pirtir têk biçin."

Rojnamevan Bêrîvan da zanîn ku sîstemên li dijî îradeya gelan pişgiriyê didin hev û kiryarên wan li dijî azadiya gelan in. Bêrîvanê wiha domand: "Hêzên serdest naxwazin ti gel û walat li ser demokrasiyê werin avakirin. Lewra dixwazin dinya di binê sîstema wan ya desthilat û dagîrker de bin. Nêrîn û daxwziyên gelan ji wan re ne girîng in, ya girîng ew e ku berjewendiyê xwe yên şexsî pêk bînin. "

**`Heta Rêber Apo girtî be, wê zilim û zora li cîhanê bidome`**

Xebatkara JIN TV Bêrîvan Yûnis diyar kir ku, gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi yek dengî û li ser yek fikrî bang dikin ku ev rêveberî mafê wan diparêze. Bêrîvan axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi hemû pêk hateyên xwe ve, bi têkoşîna xwe ji cîhanê re îsbat dikin ku, evqas şerê ku tê kirin ancex bi fikir û felsefeya Rêbertiyê çareser bibe. Ji bo wê banga me ji rêxistinên mafê mirovan re ew e ku, çavê xwe li ser vê neheqiyê veke. Ev çend sal in dewletên serdest bi taybetî dewleta tirkî hewl dide gelê Kurd ji ramanên Rêbertiyê qut bike. Ji bo pêkanîna planên xwe rojane bi tank û topan êriş dike, lê li hemberî berxwedana gelan têk diçe. Divê cîhan tev bigihe wê baweriyê ku Şoreşa Rojavayê Kurdistanê, çirûska azadiya her çar parçeyên Kurdisatê ye. Wê serketin jî ya gelê Kurd be, lewra em xwediyê vê xakê ne û ew hêzên dagîrker in."

